

Welat

Dêrik,

rewşa keçên ne zewcî ber
bî kû ve diçe?



Wêne: Fener Ahmed





Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Divê em jî wisa bikin.



Aras Yûsiv

2

Dema ku kovarek bi rengekî veşartî û dizî were çapkirin helbet hin mercên taybet hene ku divê weşanên wê tere derbas bibin da ku karibe bedewamiyê bide xwe û weşana xwe, nemaze di rewşne wek a ku çanda kurdî li rojavayê kurdistanê tere derbas dibû ji bînpêkirineke bê mînak wek ya rêjîma Beis a ku şerê elfebeya kurdî û çî kesê bi wê dinivîsand, dikir.

Tevî wan mercên dijwar, di nav her nifşekî kurdî de li rojavayê kurdistanê hin kesên pêşeng hebûn ku xwe dikirin qurbanî bo çanda kurdî zindî bimîne û wan bac û buhayên giran ji ber vê yekê danîn ta ku karîbûn pîrekê ji çanda kurdî re ava bikin ku ji nifşê berî wan bighêje yê paş wan.

Îro gelek ji mercên dijwar ên ku ev çand tere derbas bûbû, bi dawî hatin, lê em neghaştine wê radeya em karîbin bêjin ku zehmetî nemane, ji ber zehmetî hîn hene û divê bi hurgulî li ser wan were sekinandin ta ku eger ne hemû bû jî, lê beşekî mezin ji wan werin çareserkin.

Çî kesê nivîskar an ku ji nivîsandinê jiyan dike li piraniya welatan ji dunyayê nikare binivîsîne ne ku nivîsandin tiştekî bide wî ku karîbe jê jiyan bike û bi rehetî berhemên xwe amade bike, ji xwe ku ev merc pêk neyê îdî berdewamiya vî kesî di warê nivîsaninê dimîne tiştekî zehmet ji ber jiyanek heye û divê berdewam bike û bê jêdereke aborî çênabe.

Aniha li rojavayê kurdistanê hin sazî hene tevî rewşên dijwar ku piraniya bajaran tere derbas dibin, dikarîbûn

berdewan bin û rojname, kovar, an weşanên xwe bê rawestandî biweşînin, ji xwe ji nav van saziyan hinekan dikarîbûn li ser girêdana nivîsanin bi aboriyê bisekinin û nas bikin ku dema girêdana herdû aliyan bi hev hatiye, ji ber kesê nivîskar dimîne mirovek, jiyanekê wî heye û divê karibe bi barên wê rab e.

Tê xweştin hîn û bi rengekî mezintir ku qonaxek nû ji piştgiriya çanda kurdî re were avakirin û were naskirin ku ji mafê nivîskarê kurd e li rojavayê kurdistanê wek her nivîskarekî li dunayê ku ew jî berambereke aborî ji ber karê xwe werbigire ji ber nivîsandin bi xwe kareke û jêdereke ku mirov jê bijî.

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution

Rewşenbîr .. û Desthilat.

Izedîn Salih

Gelek pênasînên cuda û cihêreng ji rewşenbîr re hene,ku li gorî nêrîn,zaniştî,û radeya çand û têgihiştina her pênasvanekî ji hev cihêreng û cuda ne,bi giştî bêhtirê hozanyar û ronakbîran li hev dikin ku rewşenbîr di naveroka xwe de rexnevanekî civakî ye,xemên wî tev ew e,ku bikaribe bi dengê xwe kelemên ku dikevin riya avakirina civaka durust rake û nehêle.. ev ne mijara me ye,mijara me ew e rewşenbîrê ku di zewiyê ramanê û siyasetê de dixebite,di vî warî de em dikarin bi du qatan ango bi du celebên ve rewşenbîran rêz bikin,celebê yekem ew e,rewşenbîrê ku di derbarêkêşe,nemand,êş û pirsgerêkên civaka xwe de mijûl dimîne,bi armanca sazîkirinê bi riya rexne û şîrovekirinê ve gavên xwe bo civakek çêtir davêje,celebê duyem ew e rewşenbîrê keysbaz e yê ku ji bo armanc û sudeyên kesayetî xwe nêzîkî desthilatê dike,û di ber şaşî û kêmasiyên wê desthilatê de bergirî û berevaniyê dike.

Di tevahiya rêjîmên nedemokrat de rewşenbîrê celebê yekem xweyê amûrên zaniştîyê tê paşguhkirin,ji ber ku ew bi kêşeyên gelê xwe ve girêdayî ye,herwiha xemên gelê xwe yên hejar ji xwe re dike erk û bar,û xebat û kedê bo çareserkirina pirsgerêkên wan û parastina mafê wan dike,lewre desthilat bi zanebûn wî dixê rêza opozisiyonê ta ku ew serbixwe be jî,tersî vê ew rewşenbîr jî ji rexnen xwe bo sazîkirina civakê venager e çimkî ew xwe di ber mafên

gelê xwe de parêzer dibîn e,herwiha ew baş dizane ku pênûsa wî çekê wî yê bitenê li hember zordariya desthilatê ye,û bêyî vî çekê ne rol û ne jî giringiya wî dimîne,gel jî ji aliyên xwe ve hêviyan ser vî rewşenbîrî girê didin,û piştgiiriya wî rasterat an jî bi dizî dikin.

Ji aliyekî din ve rewşenbîrê keysbaz yê celebê duyem,bi nezelaibûna helwestên xwe tê naskirin,û nêrînên wî li gorî berjewendiyên wî û razîbûna desthilatê tîn guhertin,herwiha bo pelçîmkirina şaşiyên desthilatê mehne û behaneyan dafirîne û rasteqîniyan vedîşêre,dêmek armanca wî ewe ku gel bi kêşeyên din bibilîne da ku bala wan ji kêşeyên sereke dûr bixe û çavên wan ji desthilatê bigire,herwiha rewşenbîrê celebê duyem gav bi gav rewşenbîr û nivîskarên li dijî desthilatê dişopîne bi armanca ku şaşiyekê li ser wan nêçîr bike da ku helwest û rasteqîniya wan qelis bike,Deshtilat jî ji aliyê xwe vê piştevaniya van rewşenbîrên keysbaz dike û wan bilind û bibandor

dike,çimkî zaniştî û dengê wan di berjewendiyên desthilatê de ye,lewre desthilat wan wekû welatparêz û serbixweyan dide xuya kirin,da ku gel di bin bandora wan de be ango alîgirê desthilatê be.

Dûmahî ew e ku rewşenbîr alava pêşketina civakan û têgihiştina gelan

e,lewre ji berpirsyartiya civakê ye ku bingeheke durust ava bike û av bide,da ku ew bingeheke bibe kevirê avahiyê yê yekem di avakirina civakê de û ji berhemên xwe rewşenbîrîn paqij û durust bide,ku ew rewşenbîr bi erkê xwe rabin û bê mandîbûn ji bo gel û civaka xwe bixebitin,dêmek avakirin û pêşbirîna welat û civakan ne bi tenê erkê rewşenbîr û çekdaran e,lê belê erkê her mirovekî ye ku di nava civakê de dijî.



TÊRA KAYÊ

Kemal Alsîno

Hebû nebû carekê
Li gundekî tarekê
Xort û keçek evîndar
Bi hevrebûn dost û yar
Soz dabûn hev sersalê
Dînin bingehê malê
Govendê bigerînin
Kulên xwe dawêşînin
Xizm û dosta tev bînin
Wan li hev bi civînin
Bîr anînên xwe bêjin
Şaştîy ên xwe bavêjin
Bi hêviya paşeroj
Xweştir bibe ji ev roj
Lê sal hate bi Şilî
Qad bi sipî Xemilî
Lê sipî didûmiya
Li her dever û ciya
Kêm dibû êm ê sewal
Şîn ket hindir ê her mal
pez kêmbû ro bi ro
sed xwezî bi roja do
pez ê bav ê qîzê çû
Hew nema Hesp bide dû

Keç diçû cem yarê xwe
Lê nedkir ji serê xwe
Têrek ka ji wî dixwest
Diyarî bid bavê mest
Lê xort dilê yarê hişt
Lê şikandî mil û pişt
wê Lêr vala vegerand
Serî li wê digerand
Ka ji bo Mihîne ye
Ew maye êm ê wêye
Lê Mihîna wiya boz
Nig rada ma bê bîn poz
çû zivistan hat Bihar
Kesk xemilan de her war
Xort derdikete çolê
Bi keser digot gulê
Sala nû li me bado
Kinka xwe b'têrek ka da
Mihîna boz jî nig rada

Bê kes mam li vê qada
Min got qay zivistan e
Bihar barkir nema ne
Dawya dawî kinikê
Da bi kaya têrekê
Ev zivistan a Şilî
xêra wê tev bû xwelî ■

واقع الثقافة في كردستان سوريا

حسن حسين



عن المهارات والتزوير واللعب بأحاسيس وإرادة الجماهير أو القراء، وكان يتوجب على هؤلاء المثقفين الحفاظ على تجمعهم تحت مظلة واحدة لا التشرذم والتشتت بين عدة مظلات، وإيجاد الحلول المناسبة بشكل ديمقراطي ضمن مؤتمرات شرعية، والابتعاد عن الحلول الجاهزة بما يناسب مصلحتهم اللاعقلانية واللاهافة في التعامل مع الأحداث الجارية.

المطلوب اليوم الحفاظ على وحدة الكتاب والمثقفين والابتعاد عن أجندات لا تخدم الحالة الثقافية في كردستان سوريا، فلابد من إعادة التخطيط ووضع أسس بناء مستندة على مبدأ الشفافية والإيمان بالديمقراطية وأيضاً الإيمان باختلاف الآراء واحترامها لتطوير المناخ الثقافي نحو الأفضل وتزويد تلك المؤسسات الثقافية بكوادر لهم نتاجهم الثقافي والفكري الكبير، تلك النتاجات التي تعي دور المنظومة الثقافية بعد المعاناة من تراجع حالة الخطاب الثقافي في ظل هذه الظروف القاهرة التي تمر بها سورية عامة ومناطقنا الكردية خاصة. ■

تعيش الثقافة الكردية وخاصة في كردستان سوريا مناخاً ضبابياً، وتتجه نحو منعطف بعيد عن القيم الإيجابية التي من المفترض أن تكون هي العليا بالنسبة للمثقفين الذين ينظرون إلى آفاق جديدة أمامهم، مع ذلك لا زال وجدانهم ينبض بالتفاؤل لتقديم أعمال أدبية وثقافية تتضمن جمال الروح وحب الإنسانية وتدعو إلى إحلال السلام بين كافة مكونات المنطقة.

وفي كردستان سوريا باتت السياسة تسلط ظلالها على كل شيء بما فيها الثقافة، وظل هؤلاء المثقفون وخاصة الذين رسموا صورة غير مناسبة (مشوهة إن صح التعبير) لثقافتنا الكردية متأثرين بالحالة السياسية وخاصة من ناحية المحسوبيات والانشقاقات التي حدثت وتحدث في البيت الثقافي الكردي، فإن المناداة باستقلالية الثقافة التي لا تعبّر عن لون سياسي مؤطر هي مرآة في غير مكانها، نتيجة لعدم وجود هذه الاشتراطات التي يجب أن تتوفر في سياسة هذه التجمعات تحت ما يسمى (الاتحادات) بمختلف نزعاتها السياسية وميولها الأيديولوجية، حيث لا يتطابق مصطلح المثقف المستقل على أغلب أعضاء هذه الاتحادات فهم ينتمون إلى تنظيمات سياسية حتى لو أعلن البعض منهم أنه لا يمثل لونا سياسياً أو ينتمي إلى فصيل سياسي إلا أنه بالتأكيد ينتمي إلى مدرسة أيديولوجية، وهذا الانتماء يفرض عليه التعبير بشكل يعكس موقف تياره ومواقفه السياسية.

وأفضل مرآة تعكس الواقع الثقافي السيء هي ممارسات النخب والتجمعات الثقافية عبر كل الوسائل المتوفرة، لذلك لابد من التعامل مع الواقع الثقافي الموروث في منطقنا عبر قرون بسلبياته وإيجابياته بكل صدق وشفافية، بعيداً

Qelem

Nî'uman Osman

Min ji ber van êş û janan
Wer tu kêşanî..... qelem
Ez biçûk bûm tim li jêrê
Wî birim banî..... qelem
Dariwê derd û birînan
Tim di nêv hêsrên te tîn
Dame ber pêlên di torê
Kirme hozanî..... qelem
Wî spartî min ji baran
Ku çiya hilnagirin
Rajimê ustû şikeştî
Yan jî zindanî..... qelem
Sed hezar awir me dane

Jîn û hêjî tênebûm
Lê me dî girtin buha tê
Xwîne hem canî..... qelem
Şehsiwarê dil bi rê ket
Xweş giha gola evîn
Lê mixabin hêviya dil
Çû bi arzanî..... qelem
Qîr dikim çax û dema xwe
Bo çî hatî bo çî çû
Tê zimîna kevne salan
Wer bi talanî..... qelem
Jan û xortanî bi hev re
Mîl bi mîl tîn û di çin
Ma li şûn wara beyarek
Dar û pîranî..... qelem
Asiman çendî fireh tê
Pir mezin dîr û bilind
Lê sitêr û heyv û rojin

Kêl û nîşnî..... qelem
Pesn û hiskirna buharê
Sorgulin yan bilbilin
Lê giya ewqa bi nazî
Nayê bîr anî..... qelem
Em bi xwe peşk û dilopin
Wêneya jînê didin
Sermedî ger tû bi mênî
Ka çî şîn anî..... qelem ■

Tenê ramûsanek

Hekîm Oso

Hêsirên çavên te meya buhaye
 Di binê peyalê de windaye
 Li ser dêmên te
 Keskesor neqîşandî ye
 Hemû rengên jiyanê têde
 bi cî dibin
 Dilê min bi kêf û kenê te zengîne
 bi kul û derdên te
 bi çîrokên sed salî
 bi moşekên evîndariyê
 Ez tenê serkirdeyê dilê te me
 ez tenê dikarim kilîtên dil
 bişkînim
 ne buhar
 û ne payiz
 Dikarê li himber hêza dilê min bi qedîne
 Tenê qeder
 Ê yezdanê wê qederê
 Karin di navbera vî dilî de
 Xêzek asoyî stûr ava bikin
 Ez û te
 Em nikarin li dijî hêza xwedanê de bixebitin
 Lê emê bibin çîrokek du evîndara
 Li ser zimanê her dayikê
 Di navaroka pirtûkên evînê de
 Emê bibin mecnûn û leyla yên sedsala 21ê
 Salê carekê tê bibe mêvanê min
 Tenê ramûsanekê ji te biştînim
 Lê ne li ser zemînê

Li asîmanê yezdan
 Li ser piştê qederê
 Em ê bibin du stêrk
 Şevên evîndara geşbikin
 Keç û xort
 Zarok
 Pîr û kal
 Wê bimînin li hêviya wê rojê
 Tenê ramûsanek
 Ê kêlîkek bê deng
 Bi hezarê xewnan dibin raştî
 Bi hezarê zimanan şermezariya qederê bikin
 Tenê ramûsanek li asîmanê yezdan
 Ê kêlîkek bê deng ji temenê qederê. ■

في توعية الناس وتشجيعهم في تسهيل أمور الزواج. وأدت هذه الظاهرة إلى انخراط المرأة في العمل بنسبة تفوق 30% وذلك في مؤسسات مختلفة وفي مختلف المجالات كتوجه إلى مهنة الخياطة والقيام بالأعمال الزراعية وانخراطهن في الأعمال الإغاثية ■

ونسبة العنوسة تتراوح ما بين مواليد 1982 حتى 1988 وهي أكبر نسبة من العنوسة ضمن هذه الفئة العمرية وتتواجد أيضاً نسبة لا بأس بها من العنوسة ضمن مواليد 1974 فما فوق.

80% من المجتمع ينظرون إلى هذه الظاهرة على أنها طبيعية ضمن هذه الظروف الراهنة التي تمر بها سوريا بشكل عام وديرك بشكل خاص وذلك لما شهدته المدينة من حالات هجرة سواء أكانت

نحو دول أوروبا أو نحو جنوب كردستان، كما شهدت المدينة زيادة في ارتفاع نسب الهجرة بين فئة الذكور التي تتفوق على نسب الإناث وارتفاع الأسعار سواء أسعار العقارات أو المواد المنزلية.

هناك كثير من الأحزاب السياسية الكردية بذلت جهوداً واستخدمت كافة الأساليب للحد من هذه الظاهرة أو تخفيفها على أقل تقدير.

فقد أقيمت العديد من الندوات والمحاضرات التي عملت على توعية الناس للأسباب السلبية لهذه الظاهرة بأساليب متعددة ومنها (تشجيع إقامة حفلات الزواج الجماعي) وهناك دور كبير لأئمة المساجد




العنوسة في ديرك

عمر أحمد



مناسبة للذكور كسبيل للعيش في مدينة ديرك .

وتصل نسبة العنوسة في مدينة ديرك إلى ما يقارب الـ 55% فما فوق .



بعد مضيّ خمس سنوات على الأزمة في سوريا ظهرت عدة مشكلات في المجتمع وتفاقمت، ومنها (العنوسة) وبرزت بشكل ملحوظ في المجتمع ومنها مدينة ديرك ومرّد هذا الأمر عدة أسباب منها :

1- هجرة الشباب: وهي من الأسباب الرئيسية خصوصاً بين الفئة العمرية 20-35 سنة أي الشباب في سن الزواج

2- الأسباب الاقتصادية : حيث زيادة مصاريف الزواج وغلاء الأسعار كالذهب والمواد الأساسية اللازمة للزواج كالأثاث المنزلي والأدوات الكهربائية وغيرها

كما أن زيادة أسعار العقارات هو السبب الأبرز في تفاقم هذه الظاهرة الأمر الذي أدّى إلى عزوف الشباب عن الزواج بنسبة كبيرة

3- انخراط الشباب في الأعمال العسكرية : وذلك بسبب الهجمات التي شنها ويشنها المتطرفون ما أدّى إلى انخراط نسبة كبيرة من الشباب ممّن هم في سن الزواج ضمن الأعمال العسكرية

4- الغموض الذي يحيط المستقبل أدى أيضاً إلى عزوف الشباب عن الزواج .

5- زيادة نسبة ولادة الإناث من الذكور في المجتمع أدى أيضاً إلى زيادة نسبة العنوسة في المجتمع .

6- عدم وجود فرص العمل

العنوسة في ديرك

في الأهمية، في الحقيقة لم يبق من آثار الموقع اليوم سوى أجزاء من سورها وبعض أساسات غرف الأبراج في زوايا سور القلعة، إضافة إلى المسرح الروماني الرائع الذي يعود تاريخ بنائه إلى القرنين الثاني والثالث قبل الميلاد.

عين دارة: مدينة أثرية غربي قرية عين دارا الحالية بمسافة 1 كم، وعلى مسافة 5 كم جنوبي مدينة عفرين، تحيط بها سهول خصبة من ثلاث جهات، ويحدها نهر عفرين من الغرب على بعد بضعة مئات من الأمتار منه، كما يخترق الموقع جدول ماء ينبع عين دارا، الذي يأخذ مجراه من بحيرتها الصغيرة، ليصب في نهر عفرين غربي التل.

عفرين والحصار: كما ذكرنا فإن مدينة عفرين تضم سبع نواح، وكل ناحية تضم بدورها ما يقارب الـ 40 أو 50 قرية، و مجموع قرى عفرين ونواحيها هي 366 قرية، كان أغلب سكان مدينة عفرين هم من الكرد باستثناء عفرين المدينة والنواحي، فكان فيها وجود للمكوّن العربي ولكن منذ بداية الحرب في سورية، أصبح يتوافد إلى مدينة عفرين النازحون من كل حدب وصوب، وخاصة من مناطق ريف حلب الشمالي، كونها محاذية لمدينة عفرين وخاصة القرى والبلدات التابعة لمدينة أعزاز، فقد استقبلت مدينة عفرين ومنذ 5 سنوات ما يقارب الـ 250 ألف نازح، هربوا إلى مدينة عفرين هرباً من بطش الفصائل المسلحة التي هاجمت مدنها وبلداتهم فلم يجدوا سوى عفرين ملجأً آمناً لهم، فكانت بمثابة مأوى آمن لكل من يقصدها هرباً من القصف والقتل. لم تستطع التشكيلات المسلحة النيل من عزيمة هذه المدينة، لذلك حاولت وبشتى الوسائل الضغط على مدينة عفرين اقتصادياً وفرض حصار خانق عليها من خلال إغلاق طريق الإمداد الوحيد للمدينة من طرف مدينة أعزاز المحاذية لها ومنع وصول المواد إلى المنطقة، منذ عام 2013 وعفرين تعاني فأسعار المواد في المدينة ارتفعت بسبب الحصار الخانق، بالإضافة إلى استغلال التجار وأصحاب النفوذ لحاجة الناس، ممّا أثقل كاهل المواطن في تأمين الحاجيات الضرورية لاستمرار الحياة، ومن هنا بدأت مأساة هجرة أهالي عفرين وشبابها إلى مناطق الجوار لتأمين قوت عيشهم.

عفرين والنزيف: بدايةً، قصد أهالي المدينة الدولة التركية كونها تحاذيها، وكان أغلب الشباب السوري هناك يعمل في معامل الخياطة التركية لمدة لا تقل عن ثلاث سنوات، إلى أن ضاقت بهم الدنيا في هذه المعامل التي كانت تهيئهم كونهم لاجئين سوريين، ثم وجد السوريون ملجأً آخر وهو الهجرة إلى الدول الأوروبية عبر طرق غير نظامية من خلال اجتيازهم لبحر إيجه انتقلاً لأحد الجزر اليونانية، هناك بدأت مأساة السوريين الكبرى، فقد أصبح بحر إيجه يسمى ببحر الموت، فقد غدا الكثير من السوريين قربانين لهذا البحر هرباً من حرب طال أمدها.

عفرين، المدينة الكردية التي توصف بجنة الله على الأرض، ودعت الكثير من شبانها وشاباتنا بين مهاجر ومسافر وشهيد، وتتساءل دائماً عن موعد عودتهم الذي طال انتظارها له.

عفرين الجنة التي تنزف زمن الحصار

آيندا كوران

عفرين الجنة: منطقة عفرين منطقة جبليّة، معدلات الارتفاع فيها 700 -

1269 م، وأعلى قمة فيها الجبل الكبير كريبه مازن (Girê Mazin) الذي يعد جزءاً من سلسلة جبال طوروس، يبلغ عرضها من الشرق إلى الغرب 55 كم وطولها من الشمال إلى الجنوب 75 كم، وهكذا تساوي مساحتها حوالي 3850 كم²، أي ما يعادل 2% من مساحة سوريا تقريباً، ومنطقة عفرين متنوعة في جغرافيتها بين السهول والجبال، ويمر بها نهر عفرين الذي يمتد في سوريا مما يقارب 85 كم، ويعتبر هذا النهر وروافده من أهم المصادر المائية لهذه المنطقة الزراعية.

إدارياً، تتبع منطقة عفرين لمحافظة حلب، ومركزها مدينة عفرين التي تبعد عن حلب 63 كم، عدد السكان حوالي 50 ألف نسمة، تتألف بالإضافة إلى مدينة عفرين من سبع نواح هي: (شران، شيخالحديد، جندريس، راجو، بلبل، المركز ومعبطلي) و 366 قرية، يبلغ مجموع عدد سكان منطقة عفرين (523,258) نسمة حتى تاريخ 31 - 12- 2010 وغالبيتهم من الأكراد.

تتميز مدينة عفرين بطبيعتها التي تجعل كل من يزورها ينبهر بجمال مناطقها وأثارها، بالإضافة إلى جبالها العالية وغاباتها التي تجعل منها منطقة سياحية بامتياز. من أهم مواقعها الأثرية قلعة سمعان وعين دارة وقبة النبي هوري والجسر الروماني القديم والعديد من الأماكن الأثرية الأخرى، وللتعريف قليلاً بهذه المناطق الأثرية، سأحدث عن كل منطقة بإيجاز.

قلعة سمعان أو دير سمعان: وقد سمّي بدير سمعان نسبة للقديس والناسك السوري سمعان العامودي، حيث لجأ إلى دير ثلاثيسوس الذي عرف لاحقاً باسم دير وقلعة سمعان، وكان ذلك في عام 412 م، حيث كان يصوم أياماً دون طعام أو شراب، فيبقى طيلة تلك الأيام واقفاً مسجاً لله ومتعبداً، فقد اعتزل سمعان العامودي الناس في هذا المكان متعبداً، وعاش فوق عامود بارتفاع 40 ذراعاً / 15 متراً تقريباً، لمدة أكثر من أربعين سنة، وكان تلاميذه يصعدون إليه فوق رأس العامود ويصوره الناس للقداسة.

قبة النبي هوري: حيث يوجد في الموقع قلعة النبي هوري، كانت المدينة ذات يوم مركزاً دينياً وعسكرياً مهماً وذات شهرة كبيرة. وهي اليوم موقع أثري وسياحي غاية



Tirbespî, çandiniya di hewşan de. Yasmîn Hesen



Herêma ku çandinî têde pêknewê, herêmeke ziwa ye û bê jiyan e, jiber ku çandinî jiyanê xweşdike, bi taybetî çandiniya ku xwarina mirovan jê bê.

Herêma Tirbespiyê wekî hemî herêmên rojavayê kurdistanê herêmeke çandinî ye, çandinî beşekî sereke ye û roleke wê ya mezin li ser jiyan mirovan heye.

Mijara ku emê li ser baxivin têkliyê wê bi xwarina mirovan re heye, ew jî çandiniya di hewşa malan de ye, li Tirbespiyê u gundê derdora wê, weke em hemî dizanin ku şînahî ji berdewamkirina jiyan mirovan re giring e, û piraniya şînahiya ku di bazara bajarê Tirbespiyê peya dibe, ji derveyî herêmê tê, mîna (Bacan, Bacanên reş, Petat, Îsot), û buhayê şînahiyê di bazarê de pir bilind e, gelek ji welatiyan dibêjin ku ew nizanin ev şînahî bi çi avê jî hatiye avdan, gelo ev av paqije yan na, ji ber vê yekê welatiyên Tirbespiyê u gundên derdora wê berê xwe dane çandiniyê di hewşê malan de, şînahiya ku tê çandin di hewşan de evin: (Îsot, Pîvaz, Bamî, Tivir, Xeyar.....).

Her wlatîyekî ku xaka çandiniyê di hewşa mala wî de hebê ew şînahiyê lê di çînê, ji ber ku ew pê dizanin ku ev şînahî bi aveke paqij hatiye

avdan, weke ku welatî (Ebdurehman) ji gundê Tilberhem ji kovara Welat got: Her wiha ji ber buhabûna zêde ya şînahiyê di bazarê de, welatî çandiniya şînahiyê di hewşê xwe de bi kar tînin.

weke ku du welatiyan (Şerîfa û Zekiya) ji bajarê Tirbespiyê ji Welat axivîn:

Lê carcaran pîrsgirêk li pêşiya welatiyan derdikevin derbarî çandiniya di hewşan de, û pîrsgirêka sereke ya herî mezin ev e, bi taybetî di werzê havînê de, ji ber ku aştê avê di vî werzê de dadikeve û kêmkirî, weke ku (Ebdela) ji me re diyar kir, ku ew jî welatiyeke ji gundê Hilwa Şêx e, ku dikeve roavayî bajarê Tirbespiyê. Bê goman çandiniya di hewşan de, beşekî mezin ji xwestekên welatiyan pêk tîne, lê ne hemî xwestek, ji ber ku ne hemî şînahî li herêmê çêdibin û biserdikevin, lê bi ser wilo de welatî hewşên xwe bi piraniya şînahiyê di xemilînin, û çiqasî hewş biçûkbê jî, lê xwediyê wê hewşê çandiniya wê ji destê xwe na berdê, her wiha hin ji welatiyên ku hewşê wan mezinin, ew şînahiya ku di hewşên xwe de çandine, peyadikin bazara bajêr, û bi nîrxekî erzan difroşin. ■

Pêwendiya jiyanê

Umer Ehmed

Ji ber lawazbûna torên têkliyan ji bo pêwendiyê li sûryê, piştî van bûyerên ku çêbûne gelek pêwîstiya mîlet bi internêta çêbûye, bi taybetî internêta asmanî.

Lê gelek helwestên gelê me li ser vê internêta hene, hin helwestê erênî ne û hinek helwestê jî neynî ne. Ji ber

ku nîrxê vê internêta gelekî boha ye, li bajarê dêrikê tevî ku navendên internêta li bajarê Dêrikê hijmara wan dighe 10 navendan, vê hijmarê ta niha nedikaribû ku nîrxên wê erzan bike, lê tevî evqas neyniyên internêta dîsa dimîne alaveke tenê ji bo pêwendiya mîlet bi kesên dervayî welêt re.

Ji bo vê rewşê gelek kesan ev mijar nîrxandin û ji kovara welat re wiha axivîn.

Kamîan Hikmet: Internêta li bajarê Dêrikê gelekî buha ye, li Qamişlo her demjimêrek bi 100 lêreyî sûrî ye, lê li bajarê Dêrikê her 35 mb bi 100

lêreyê sûrî ye, ev 35 mb bi dirêjahî 15 xulekan berdewam dike û gelek caran internêta qut dibe.


Kawa Ismaîl xwediyê kafê nêtê ye, ji kovara Welat re axivî û wiha got: Li qamişlo ne tenê bi demjimêrane, lê bi rengekî mehane jî heye.

Xetên enternêta li Qamişlo D.S.L yan jî vabir in, ew xetana li Qamişlo, Hesiça û li bajar ne din jî hene, lê ev xetana negihîştine bajarê Dêrikê û tenê li Dêrikê xeta ezmanî heye, ji ber vê yekê enternêta li Dêrikê gelekî buha ye.

Em bi mîgatan difroşin ew jî li cem mîletê me ne cihê razîbûnê ye.

Pir caran me hewl da ku em wek xetên li Qamişlo bighînin Dêrikê, lê rêveberiya xweser destûr neda.

GELO ev pêwendiya ji bo mîletê me pêwîste yan na û çawa dê ve ev pirêsgirêk çareser bibe? ■



Huner li bajarê Dirbêsiyê

Hisên Al Sîno



Di vî bajarokê biçûk de, mîna hemî bajarokên kurd kir, dibe ku ji wan zêdetir jî kiribe.

Bajarê "Dirbêsiyê" bi spehîbûn û bêdengiya xwe navdar e, ku be ser parêzgeha Hesiçayê ve ye, dora "70 K.M" î ji parêzgehê û sînorê Turkiyê dûr e, tenê Tramê û Têla direh Dirbêsiyê û Turkiyê ji hev cuda dike, ev tîlê kurdistanê jî ji hev veqetîne, bajarê ku bi çandinî yê jî navdar e, Bajarê sunabilê genim ê zêrîn û pembûyê sipî, keyanî ya buharê (çolbeştan û Kebzê kîkan).

Di vî bajarê navbûrî de û di meydana hunera kurdî de, gelek navên mezin, çî ji aliyê Stranbêjiyê ve û herwiha jî Hunera nîgarkêşî û şewekarî di asmanê wî de çirisîn.

Berî ku em navên ên ku di çarçewa hunerê de bi tevayî di xebitin binin zimên, emê hinekî li ser hunerê baxavin.

Li vî bajarî huner roleke sereke di jiyana mirovan de leyîştîye, Ku çîrokên dîrokî yê gelê Kurd di riya hunerê re bo şênîyan hatin veguheştin, herwiha destanên lehengî û mîrxasiya kurdan, li ber nîfîşê nû daniye, bi taybetî jî li ser serhildanên kurd û rêberên kurdan û şervanên Kurd yê ku de qada Şer û tîkoşînê de qehremaniyên bêhempa xêzkirine û zordarî û bobelatên ku be ser her çar parçeyên Kurdistanê qewimîne di rêya hunerê diyar û berçav bûye.

Huner pênasiya gelan, û Hunera Kurdî taybetiyê wê heye, (Bêparkirin, sitemm, koçberî û kuştin) tevî êş û azaran jî, muzîka kurdî xweştirin muzîke, û hunermendên şewekar parçeyekî bîngêhî ji hunera kurdî, wan bi tabloyên xwe trajediya gelê kurd, û li ser xewna dewleteke serbixwe û azadiya kurdistanê, birîna gelê kurd

û trajediya salan û salan neqşandine.

Navên hin ji hunermendên (Dengbîr) ji bajarê Dirbêsiyê: Li ser serê wan, hunermend û bestekar "Mohammad ali Şakir", "Remezan Necim Omrî" dengê çiyayê wek çiyayê Kurdistan ku hunermendê pêşî bû di strand li ser çûna Barzaniyê nemir (Barzanî ji vî jîyanê barkêr), "Mehmud Azîz Şakir" xwediyê stranên herî xweş jî di nav de (Gûlizar - Rêwiyo), "Gulîştana Sobarî" (Qamişloka Evinê), "Mizgîn tahir" opera ye kurdî, "Beşîr - Hassan - Husên Salih - zibir Salih" ku dawetan Kurdên li herêma rengê din hatin dayîn, û nîfîşê niha bi kurtî "Montaser Saleh, Behcet Eli, Ronîcan Hisso, Zuhêr Eli - Ehmed Silo, Dilocan û Mihemed Şêxmûs) e.

Hunermendên şewekar em dikarin navên hinan ji wan bêjin, ku ketine di lîsteyê Hunerê ya Navnetewî û navdaran de: "Beşar el-îsa", "Kito Elsîno", "Ibrahîm el-Heyderî", "Cemal Ebdo", "Ebdo Xizêm", "Mahîn Şêxanî", "Munîr Şêxê" "Arişvîn Mîka'îl", "Luqman Ehmed", "Kidvano Eliko", "Alan Mîro".

Di dawiyê de li bajarê Dirbêsiyê hîna xebata hunerê berdewame, digel lîbûrênê ji hunermendên ku min navên wan ji bîr kirin. ■

Encama Sitem û Eşîrperestiyê Berdan e.

Sîmav Hesen.



baş nas kiriye,dibêje: “Zewaca pismam û dotmamê ji derveyî rojhilata navîn ti caran bê pirsgirêk derbas nabe,ji ber pîrraniya caran ev zewac ne bi razîbûna jinê ye,yasayên Ewropayê mafê jinan diparêzin,li Ewropayê



eşîr,ap û xal tune ne û gerdiş jî tune ne,dewlet heye û mafeke paraştî heye”. Aras dibîne ku carcaran Berdan ji jiyana hevbeş ya ku pirsgirêk tê de hene çêtir e û

Dişevbuhêrkên buharê de,di nav civatên li ber deriyên malan de,gelek mijar tên gotin,piraniya wan di salên dawî de li ser koçberiyê û Ewropayê ne,ne veşartî ye ku gelek caran ev civat ji ber valahiya demê lidardikevin,lê li aliyekî din hin mijarên metirsîdar jî tene gengeşekirin,diyardeya berdanê li nav koçberên Ewropayê yek ji van mijaran e.

Sedem Azadî ye:

Luqman (46 salî) ye,ji sala 2008an ve Li Brîtanîyayê dijî,ji ber nakokiyên ku bi wî û hevjinê wî re çêbûn,giha aştî ku jin doza berdanê dike,”Azadî şaş tê fêmkirin “ Luqman Dibêje û berdewam dike: “Hevjîna min doza berdanê kir ji ber wê didît ku ez azadiya wê sînardar dikim,lê ez wê bernadim,ji ber ez naxwazim her sê zarokên min li welatên xerîbiyê şerpeze bibin “.

Luqman li firoşgehekê kar dike û dibîne ku jiyana li welatên koçberiyê,zarokên wî jî ji dest wî dibe: “Eger Sosyal bikeve malê de,nakokî çêdibin,bi taybet li cem jina ku di warê abûrî de azadî nedîtibe,hevjinê min jî mînameke ji jinên ku nebûna nasnameyê,bû sedem ku gelek ji mafên wê ji dest wê biçin” wisa Luqman sedema nakokiyên şirove dike û dibîne ku egera hebûna malbateke yekgirtî tune ye.

Li Ewropayê Eşîr Tune ne:

Lê Aras (33) salî ye,ji sala 2005an ve li Okraniyayê dijî,dibîne ku wî civaka Rojavayî

dibêje: “Zarok gelek ziyanan ji ber şerê dê û bav dibînin, ji ber wilo divabe civak bighê wê baweriyê ku berdan tiştekî normal e”.

Berdan Riyakşyon e:

Welat (36 salî) ye,ku berî 2 salan gihaye Hanoverê dibîne ku mijara berdanê li Ewropayê bi xwe ne gelekî giring e,ji ber ti raporên fermî di vî warî de derneketine,berdana ku li Ewropayê çêdibe jî li gor nerîna Welat,ne bi razîmendiya her du aliyên e û berdewam dike: “Dibe ku sira azadiyê ya li ber deriyê firoşgehekê li Elmaniyayê li rûyê jinê bide,yek ji sedeman be,ew azadiya ku li koçberiyê,bi şaşî şirove dibe,ya rast ku wateya azadiyê,girêdana di nav endamên malbatê de xurt bike”.

Herweha Welat wekî yek ji xortên ku li hêviya derfeta zewacê ne, dibêje: “Mirov nikare bi ti mehneyê bibêje sedem Ewropa ye, ev tevde derew in, jina ku li Welat bi mirov re be, dê li çî devereke din jî û li tevahiya cîhanê pêre be, hûnguliyên jiyana rojane di nav jin û mêr de ji ber xaknîgariyê nayên guhertin, ji ber divabe zewac li ser bingeheke xurt rabe “.

Sitem sedem e:

Darîn (27 salî) ye,di sala 2012an de ber bi Holendayê ve Koçber bûye,li gor nerîna wê,bar tev de di stûyê civakê de ye,ji ber ku ew her dem dibîne ku jina berdayî nehêjayî rêzgirtinê ye,dibêje:

“Sedema vê yekê ew e ku sistemên welatan,li ser piştgiya mêran radibin nizimbûna rêjeya berdanê li rojhilata navîn encama yasayên olî ye ku li gor wan herçiqas jin tundiye bibîne,nabe ew ji bin sîwana malê û mêr derkeve,li himber vê yekê jî,ev yasa piştgiya kiryarên şaş yên mêr dike û jinê weke bûnawereke bêhiş û nebaş dide xuyakirin “.

Herweha, Darîn rexneyan li medyayê jî dike û dibîne ku ragihandin tu caran bîr nabe ku şewqê bavêje

ser tundiya derûnî yan ya bêjeyî li dijî jinê,lê herdem ew amade ye ku jina berdayî weke tiştekî tewş di civakê de bide xuyakirin ,ji ber ku herdem ew dixwazin jin di nav destên wan de weke ajeleke kedî be.

Darîn li ser berdana xwe daxive û dibêje:“Ez neçarmam kuezxinîziyê daqurtînim,ew jî di bin duruşma azadiyê de dihate kirin,hevjinê min digot ku ew azad e û dikare bi jinên din re derkeve,dawiyê min biryara berdanê stand,di wê demê de,kesên nêzîkî min digotin tu doza berdanê dikî da ku tu jî weke hevjinê xwe azad bî,ew herdem hewl didin ku jinê weke bûnawereke ku pîsî di xwîna wê de ye,bidin xuyakirin û kînga ew ji bin sîwana hevjinê xwe derkeve,dê bibe berbeden” wisa Darîn zordariya nûjen li gor nerîna xwe şirove dike.

Li gorî welatiyên ku li welatên Rojavayî bi cih bûne,sedem pir in,lê dema ku roj li welêt diçe ava û civatên buharê bi dawî dibin,ev gotin tev de bi qaşilê dendikan re tene rêşkirin û derî jî li her malbatekê tê girtin,da ku pirsgirêkên malê ..di hundirê malê de bimînin ...!!





Hevdîtina Tevgera Sivîl li Cezîrê

Salar Salih

Di bin navê hevdîtina tevgera sivîl li Cezîrê, nûnerên bîst û sê rêxistinên civaka sivîl li Hesekê civiyan, li bargeha navenda Aştiyê û Civaka Sivîl li bajarê Hesekê, Dawûd Dawûd hevrêzkarê giştî yê hevdîtinê ji kovara Welat re li ser vê hevdîtinê axivî û got :

Bi serperiştiya rêxistina (AVA SCCK) û bi piştgiriya diravî ji saziya ((Beytuna Sûriya)) ji çend heyvan ve dest bi kar di vê projeyê de bûye, û bi destpêşxeriya şeş rêxistinên sivîl, ew jî ev in :

- 1- Navenda Dadmendî û avakirinê, (Serê Kaniyê).
 - 2- Navenda Arîdo ya civaka sivîl û dîmoqrasiyê (Qamişlo).
 - 3- Navenda Aştiyê û Civaka Sivîl, (Hesekê).
 - 4- Navenda Geşepêdanê û Çalakiyên Sivîl, (Tirbe sipiyê).
 - 5- Rêxistina DAD ya berevaniyê di ber mafên merovan de, (Dirbêsiyê).
 - 6- Hevgirtina bi hev re ji bo Amûdê, (Amûdê).
- Armanc ji vê hevdîtinê, wek ku hevrêzkarê giştî şirovekir, xurtkirina pêwendiyên di navbera rêxistinên beşdar de, û sazkirina torekekê

ji rêxistinên civaka sivîl re, da ku rê li pêşiya hewlidanên afirandina nakokiyên di navbera pêkhateyan de bê girtin û paraştina pêkvejiyanê. Herweha hevrêzkarê giştî Dawûd Dawûd amaje bi giringiya hevrêziyê di navbera rêxistinên sivîl de kir, bi armanca pêkanîna projeyên hevbeş di paşerojê de, jiber ku ev yek mercekî sereke ye ji mercên dezgehên dana dirav, yek ji mercên van dezgehên bo piştgiriya çî projeyê di paşerojê de, divê ku gellek rêxistin di projeyê de hevkar bin, lewra ev hevrêzî pir giring e, û heger tune be dê bandorek neyînî li van rêxistinan û her weha li civakê bike.


17 rêxistinên sivîl ji bajarê Hesekê di hevdîtinê de beşdarbûn, destpêkê nûnerên rêxistinên beşdar xwe bi hev dan nasîn, dûvre Cîhan Ismaîl endama navenda Aştiyê û Civaka sivîl goftûgo destpêkir, û xala sereke ew bû astengiyên karê rêxistinên sivîl li Hesekê, û di serî de pirsgrêka abûrî wek mezintirîn berpêk li pêşiya karê van rêxistinan hat gengeşekirin, astengiya diwem girêdayî bû rewşa ewlehî ya ne aram li bajêr, jiber hebûna hêzên Rêjîmê di nîva bazarê de û hin taxên bajêr, ev yek bandorek neyînî li karê rêxistinên sivîl dike, û jiber ku ev rêxistin nikarin di devera kontrola Rêjîmê de kar bikin, jiber ku ew bi pêwîstî rêdanê ne ji hêzên ewlekarî yê Rêjîmê.

Di dawiya civînê de, reşbeleka belgeya hevdîtina tevgera sivîl li Cezîrê li nûnerên rêxistinan hat belavkirin, armanc jê xurtkirina hevrêziyê di navbera rêxistinên sivîl de, û aktîvkirina rola van rêxistinan di prosesên geşepêdana civakî û çavdêrî û piştgiriya pirsên giştî de, herweha firehkirina bingeha gelêrî ji hevdîtinê re. ■



Gazinên welatiyên Hesekê.

Dilşad Xalid.



Li bajarê Hesekê tevî ku şer rawestîya ye û Rêxistina Da'îşê gelekî dûrî bajêr ketiye, lê hîn gelek gazinên welatiyên wî bajarî hene, nexasim ji aliyê xwendevan û karmendan ve.

Li wî bajarê ku ji bilî kurdan Ereb û xiristyan lê dijîn, welatî nema ji derbasbûna Da'îşê û topên ku ji aliyê wan ve bi ser bajêr de dihatin barandin ditirsin, lê di dema dawî de ew ji hin tiştên din ditirsin.

Li hin deverên ku hîn di destê rêjîmê de ne û rêbendên rêjîmê li wir hene, mîna taxa Xiwêran û Neşwa, welatî ji aliyê leşkerên rêjîmê ve rastî astengiyan tên.

Xwendekarê bi navê Kawa Derwîş dibêje: "kulîjên me li taxa Xiwêran in û em neçar in ku di rêbendên rêjîmê re derbas bibin, leşkerên rêjîmê jî gelek astengiyan ji me re çêdikin û carnên jî me neçar dikin ku em karê wan bikin wek barkirina axê ji bo rêbendên wan û ev yek me gelekî aciz dike, lê em newêrin baxivî û red bikin".

Ji aliyekî din ve jî, di dema dawî de rêjîma Sûriyê biryarek derxist ku li gorî wê biryarê hemû karmendên li cem rêjîmê kar dikin neçar in tevî perwerdeyê leşkerî di bin navê xweparastinê de bibin, bêtî ku armanc jî vê yekê re were naskirin.

Fayiz Ebdo ku ew jî karmendeke dibêje: "Vê biryara rêjîm gelekî em êşandin, ji ber ku em ji tîrsa ku me bibin deverên şer newêrin biçin vê perwerdeyê û heger em neçin jî tîrs ew e ku careke din mûçeyên me nedin me û me ji kar rawestînin, û heger ev yek bibe wê rewşa me ya abûrî gelekî xirab bibe".

Her li ser vê mijarê Hazim Yasîn got: Rêjîm

bi vê biryarê ji du aliyan sûdê dibîne, ji ber ku heger em tevî perwerdeyê bibin, dibe ku me bişîne deverên şer ji ber ku roj bi roj jimara leşkerên wê kêmtir û heger em neçin jî wê mûçeyên me qut bike û cardin ew sûdê dibîne.

Diyare ku rêjîm bi her awayekî dixwaze li Bajarê Hesekê astengiyan ji welatiyan re çêbike nexasim welatiyên kurd, lê pirs ew e gelo rêveberiya xweser wê çawa van pîrsgerên welatiyan çareser bike û nehêle ku ew dest ji kar û xwendina xwe berdin? ■



تصنيع جفت الزيتون (البيرين او العرجوم).

المهندس محمد شريف أحمد (جليني).

4- الجفت المستخلص زيتة يعالج بالبخار الحي في خزان الاستخلاص لاستعادة المذيب الممتص به ويكثف المذيب لإعادة استعماله بدورة ثانية من المعالجة.

5 - جزء من الجفت المستخلص الزيت منه والخالي من المذيب يحرق في فرن مجفف الجفت الرطب لتسخين الهواء اللازم لتجفيف الجفت الرطب.

6 - جزء آخر من الجفت المستخلص والخالي من المذيب يحرق في فرن مرجل توليد البخار اللازم للمصنع حرقاً غير كامل لينتج منه الفحم المستعمل للشوي والأراكيل او يحرق للتدفئة.

7 - القسم الباقي يباع على شكل جفت خالي من الزيت والمذيب للحرق أو يعالج معالجة خاصة لإنتاج علف حيواني أو إنتاج سماد عضوي أو إنتاج نوع من أنواع الخشب المضغوط.

8 - الرماد المتخلف في حرق الجفت المجفف يباع كسماد آزوتي وفوسفوري و الذي يحتوي على 3.5% من أكسيد البوتاسيوم و 12.5% على شكل مركبات خامس أكسيد الفوسفور.

وبشكل عام تصبح المنتجات على الشكل التالي :

1 - زيت الجفت 3-5 %

يستعمل في صناعة صابون الغار أو شامبو زيت الزيتون أو يكرر لإنتاج زيت صالح للطعام.

2 - الفحم 5 %

يباع على شكل قوالب فحم للحرق والشوي.

3 - العرجوم الخالي من الزيت 25 %

يباع بشكل دكمة أو قوالب والمستورد الرئيسي تركيا وأوروبا

4- الرماد 3-5 %

يمكن استعماله كسماد في بعض الأحوال

ينتج عند استخلاص الزيت من ثمرة الزيتون سواء بالمعاصر الضغطية (الطريقة المتقطعة) أو بالفارزات التي تعمل بالقوة النابذة (الطريقة المستمرة) كسبة العصر، والتي تختلف تسميتها من بلد الى آخر مثل العرجوم، البيرين، الجفت أو كسبة الزيتون وهي عبارة عن ناتج ثانوي لاستخلاص زيت الزيتون البكر، ومواصفات هذا المنتج على الشكل التالي :

1 - الرطوبة 45-60 %

2- الزيت 3-5.5 %
حسب نوعية وفعالية خط العصر

3 - لب وبذرة الزيتون 40-50 %

ويتم استخلاص الزيت المتبقي في هذا المنتج الثانوي، في كل الدول المنتجة لزيت الزيتون بطريقة الاستخلاص بالمذيبات العضوية، وفق المراحل التالية:

1 - تجفيف الجفت حتى يصبح المحتوى بالرطوبة دون الـ 10%

2 - معالجة الجفت المجفف بالمذيب العضوي (بالنفثا الخفيفة إذا كان المطلوب إنتاج زيت لصناعة الصابون) أو (بالبكسان الغذائي إذا كان المطلوب إنتاج زيت للتكرير وتحويله إلى زيت زيتون مكرر صالح للطعام) إذ يقوم المذيب بتذويب الزيت من خلاياه في الجفت، ويشكل مزيج زيت+مذيب يدعى بالميسيل.

3- تقطير مزيج الزيت والمذيب (الميسيل) لفصل المذيب عن الزيت على شكل بخار يكثف بالتبريد لإعادة استعماله من جديد كمذيب.

Serdar Darî

PEYVA WENDAYÎ

DINYA BÛ BUHAR
XUNAV HATE XWAR
LI SER GÎHA Û GUL
CEJNA DOŞT Û YAR
NE HATE BA MIN
ŞENG Û ZERÎ YA MIN
AGIR BERDA DILÊ MIN
YARA MIN EW BÛ

Peyva winda, Xwarin ek kurdî ye ji 8 tîpane ?

--	--	--	--	--	--	--	--

e	r	d	o	s	t	x	h	g	d	c
w	a	l	i	m	ş	u	a	n	i	e
b	h	a	m	i	b	n	t	e	l	j
û	u	e	n	n	û	a	e	ş	ê	n
b	b	o	m	i	n	v	s	e	r	a
û	r	a	b	o	a	l	u	g	a	a
r	a	g	e	e	d	y	a	r	r	h
û	w	i	û	w	r	n	i	m	a	î
k	x	r	b	a	e	m	i	n	y	g
û	h	a	t	e	b	a	y	n	i	d

XAÇERÊZ

Rast :

- 1- Navê Diwemîn ji Serokek Kurd – Di Laş de (Vajî) .
- 2- (Tîpin ji) Dev – (Tîpin ji) çûkek .
- 3- Eleştêk Xweş 4- Cihê tê de Genim tê Hêran (Vajî) .
- 5- (Wekî Hev) – ji tine bûnê re .
- 6- Paşbendek .
- 7- Malbatek Kurdî bi Nav û Denk li Rojhilatê Kurdistan - Dêm .

Serjêr

- 1- Durişt – Keser .
- 2- (Nîvê) êşkenc .
- 3- Hild Ango Bilin bik .
- 4- Zîv (Belakirî) – Agir .
- 5- Navek bi Wata xwe da Qurban (Vajî) .
- 6- ji Nîşanê re .
- 7- Doza ku bû Sedem ji bo şoreşa Miletê Sûrî (Vajî) .
- 8- (Nîvê) Çand (Vajî) .
- 9- Cureyek ji şînkayî .
- 10- ji bo Pirsê (Vajî)
- 11- ji Agir Çê dibe – (Dijî) hat .

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11
1											
2											
3											
4											
5											
6											
7											

19

Ferhengok

باقي	Berma
بصمة الاصبع	Pencemor
كامل، راشد، بالغ	Guncav
بغضاء، حقد	Hevrikî, kîn
بُرْهَة واحدة	Bîstek, Bênek
تنكيل	Sosret
بطل	Leheng
جمال، بهاء، زينة	Sipehî
بغض، كره	Nevîn
بائس	Babideşt

PEND Û ŞÎRETÊN KURDÎ

- Bar bare , ser bar neyare
- Bedewî nayê veşartin
- Bela ji derê bê guman tê
- Bi gulekê buharek nayê
- Bela mero ji ber nigê mero tê



Divê **hêvî** hebin, ji ber
ku bêhêvîti mirin e.



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (٣٠) ٢٠١٦/٥/٢٠